R:2

## Daxuyaniya Komîteya Nawendî a PDKÎ .....



R:4

## Kuştina kasibkarên kurd, pîlanek darêtî!



R:6

## Gola Urmiyê hêdî hêdî dibe şorekat



R:7

## Dîsan destûrnameya şer!




Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 193
22'ê Çiriya Pêşîn a 2012'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

Komîteya Nawend a PDKÎ di peyamekê de sipasiya wan hemû kes aliyan kir ku peyamên pîrozbahiyê bo serkevtina kongira 15'ê a partiyê şandine
R:2

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

YE ji rejîma Îranê re:

# "Yan teslîm, yan tehrîmên tundtir"




**Yekîtiya Ewropayê di civîna xwe ya li Birûkselê de ragehand ku, hekî Komara Îslamî bernameya etomiya xwe ya kêşesaz bidomîne, li hember de wê dorpêçên abûrî bo ser Îranê tundtir bikin.**

Eva di demekê de ye ku di hefteya derbazbûyî de YE'ê tehrîmên nû bi dijî Îranê pejirandin. Berpirsyarên YE di daxûyaniyekê de ragehandin ku heya Komara Îslam bi vî awayî bernameya etomiya xwe bidomîne, YE bi hevkariya welatên din ên cîhanê, tehrîm û givaşên zêdetir wê bi ser Îranê de bisepînin.

Dewra nû a tehrîman şîrketa millî a nefta Îranê û 25 şîrketên ser bi wê, şirketa millî a Gaza Îranê û şîrketa millî a palawtinê û bilavkirina berhemên neftî ên Îranê bixwe ve digre.

## Sergotar

## Wehşet ji rabûnê

Selîm Zencîrî

Rewşa ku niha Îran têre derbas dibe, pir aloz û awarte ye. Realîteya heyî di bin siya reşe rejîmê û siyasetên wê de bûye sedem ku eniyek xurt a cîhanî li hember de ava bibe û bi sepandina tehrîmên giran rejîmê li nav qopiya kirîzan de biçeqîne. Bi rastî jî baykotan tesîr û bandora xwe li her biyavekê de kiriye û bi taybetî derbên giran ji peykerê aboriya Îranê xistiye.

Lewma ji ber van zext û givaşên li ser jiyana xelkê û serbarê hovêtî, rijdiya serkutê û ewlehî kirina bajaran ji aliyê rejîmê ve, lê hêdî hêdî dengê nerazîbûna xelkê û hêrsa pengurî a wan tê bihîstin û dîtin. Nimûneya herî zindî jî rabûna bazariyên Tehranê li çend hefteyên derbasbûyî de bû ku xew ji çavê berpirsiyarên rejîmê herimandiye û tav û lerz û wehşetek mezin xistiye nav dil û derûna wan de.

Li hember vê kirîza aborî, giranî, tewerum, bêkarî û jiyana xirabe xelkê, rejîm li cihê çareserî û paşekişê ji siyasetên şerxwazane ên xwe de du rê girtine ber xwe. Yekem ji riya berpirsiyarên leşkirî û mesebiyên xwe ve daxwazê ji xelkê dike ku nekevin telika dujminan û li hember givaşên aborî de berxwe bidin û xwe ji rabûnê biparêzin. Duyem jî bi heman eqliyeta serkut û ber bi rû bûnê ji riya Sipah û Besîc ve dixwaze bersiva daxwaziyên xelkê û şoreşên civakî bide. Bi taybetî ku rejîmê binav hilbijartinên serkomariyê jî li pêşber de ye û dixwaze vê lîstikê jî gor dilê xwe û wekî berê bidawî bîne.

Lê metod û riya ku rejîmê bona pêşgirtin û temirandina şoreşên xelkî hilbijartiye, ne tenê serketî nebûye, belkî bûye sedem ku îrade û vîna azadîxwazane xelkê li pêxem herifandina van desthilatan de zêdetir û qahîmtir be. Bêguman çarenivîsa rejîmê jî cuda jî van nabe.

# Fîlma "Şeqama Dr. Qasimlo", xelata taybetî a rexnegirên fistîvala navdewletî a Gotam bidest xist

**Li fistîvala navdewletî a Gotam a li Niyoyorkê de, xelata lêjneya rexnegirê taybet (Êspêşêll Ciyorî) bi fîlma sînemayiya şeqama Dr. Qasimlo hate bexşîn.**

Fîlma sînemayiya "Şeqama Dr. Qasimlo" ji nivîsîn û derhênana Fethî Mîrzayiyan, û berhemhatî li Kurdistana başûr û Birîtanyayê, ku heyamek berî niha ji aliyê fistîvala navdewletiya Gotam li Niyoyorkê bo beşa pêşbaziyan hatibû hilbijartin, roja 24'ê Rezberê ji aliyê lêjneya daweriya fistîvalê ve xelata lêjneya rexnegirê taybet "Êspêşêll Ciyorî" pê hate dan û bala rojnamevanan û mîdyayên cîhanê bo aliyê xwe rakêşa.



Çendîn berhemên sînemayî ji Rûsiye, Îtalya, Ustiraliya,Mîsr, Hênd, Çîn, Feranse, Mecaristan, Amerîka, Birîtanya, Îran û Îraq li fistîvala Gotam de beşdarî kirin.

www.arsivakurd.org

Agirî 2
Hejmar 193, 22’ê Çiriya Pêşîn a 2012

# Daxuyaniya Komîteya Nawendî a PDKÎ hilbijartiya kongireya pazdê, bi boneya birêveçûna duyemîn pilînoma wê




**Bona agehdariya we em radigehînin ku komîteya nawendî a PDKÎ hilbijartiya kongireya pazdê, pilînoma xwe a duyemîn bi beşdariya endamên eslî, û endamên cihgirê Komîteya Nawendî li demijimêr 9:30’ê sibêdehiya roja Şemiyê, 29’ê Rezbera sala 1391’an a Rojî (20’ê Oktobera 2012) pêk anî.**

Ew pilînom destpêkê bi ragirtina deqeyek bêdengî bo rêzgirtina ji riha pak ya şehîdan dest pêkir û piştre rêzdar sekreterê giştî ê PDKÎ kak Mistefa Hicrî tevî pîrozbahiya ducarî ji endamên rêberiya hilbijartî ji aliyê kongireya pazdê ve, destûra karê pilînomê ku pêk hatibû ji hilbijartina cihgirê sekreterê giştî û endamên deftera siyasî, ragehand. Piştî pesendkirina destûra kar, sekreterê giştî basek hûr li ser biryar û rasipardeyên kongireya pazdê a PDKÎ pêşkêş kir ku têde bona berçav rohniya beşdaran bas ji wan kêmasî û wan pêşniyaran kir ku pêştir bona baştir birêveçûna karên partiyê ew bas hatibûn kirin, û herweha bala beşdaran bo aliyê wan erk û wezîfeyan rakêşa ku birêveberiya nû a PDKÎ bona encamdana wan divêt tekoşînê bike. Beşdaran jî tevî erêkirina vê basê, têdîtin û boçûnên xwe bi awayek çalakane bas kirin.

Piştî vê basê dengdan bo hilbijartina cihgirê sekreterê giştî ê PDKÎ birêve çû ku li encam de heval Hesen Şerefî, wekî cihgirê sekreterê giştî hate hilbijartin.

Piştî vê hilbijartinê sekreterê giştî ê PDKÎ basek têr û tejî li ser gelaleya pêşniyarî bo diyarîkirina wan kar û erkên ku endamên Deftera Siyasî hewce ye birêve bibin pêşkêşî beşdaran kir. Piştî pesendkirina wan gelale û pêşniyaran dengdan bona hilbijartina endamên Deftera Siyasî birêve çû ku li encam de endamên Deftera Siyasî hatin hilbijartin.

Endamên beşdar li pilînomê de piştî pîrozbahîkirina ji hilbijartiyan demjimêr 6:30’ê êvariya hemen rojê dawî bi karên pilînomê anîn.

**PDKÎ**
**Komîteya Nawendî**
**30.07.1391**
**21.10.2012**

## Rê û resma bidawîhatina dewreya 204 a pêşmerge birêve çû

**Rê û resma bidawîhatina dewreya 204 a destpêkî ya pêşmergeyên PDKÎ, bi beşdariya endamên rêberî, kadr, pêşmerge û malbatên vê partiyê birêve çû.**

Roja 27’ê Rezberê rê û resma bidawîhatina dewreya 204 a pêşmerge bi rêjeya nizamî ya beşdarên dewreya 204’ê dest bi karên xwe kir. Piştre rêzdar Çeko Rehîmî, Endamê Komîteya Nawendî ya PDKÎ derheq lidar xistina kongireya 15’ê ya partiyê û tehrîmên cîhanî û karîgeriya wan li ser Îranê û herweha siyaseta Komara Îslamî li dor zêdekirina heşîmeta Îranê, çend gotinek pêşkêşî beşdarên merasimê kirin.

Paşan Behmen Kerîmi, yek ji mamostayên Fêrgê, rapora Nizamî ya dewrê pêşkêşî beşdaran kir.

Di beşek din ya rê û resmê de, yek ji beşdarên dewrê bi navê Îsmaîl Zûrmend, peyama dewrê pêşkêş kir, û di beşa din de beşdarên serkevtî di dewrê de hatin xelatkirin.

Herweha di navbera rê û resmê de sê stran ji aliyê beşdarên dewrê ve hatin pêşkêş kirin.




## Heya niha 3176 zarok di aloziyên Sûriyê de hatine kuştin

**Nawenda nûçegehaniya şehîdên şoreşa Sûriyê roja 20.10.2012’an ragehand ku di destpêka nerazîbûnên xelkê Sûriyê heya niha 3176 zarok bi destê Hêzên Şebîhe wate Kinc Şexsî ve hatine kuştin.**



Nawenda nûçegehaniya şehîdên Sûriyê ku digel sazî û rêxistinên navnetewî ên berevanî ji mafên zarokan hevkariyê dike ragehand ku 3176 zarokên Sûrî di heyamê 19 mehan de bi destê hêzên Esed ve hatine kuştin ku piraniya wan bi bombebaran û destrêjiya rasterast canê xwe ji dest dane.

Nawenda navbirî eşkere kir ku bi tenê di komkujiya Gundê Sunî akincî ya "Hule" de, pitir ji 20 zarok bi awayek komkujî hatine kuştin.

Komîteya Nawendî a PDKÎ:

## Sipasiya wan hemû kesan dikin ku peyamên pîrozbahiyê bo me şandine

**Piştî dawîhatina serkevtiyane a Kongireya 15’ê a PDKÎ û hilbijartina dubare ya kek Mistefa Hicrî bo sekreteriya pariyê, komek peyamên pîrozbahiyê li hundur û derve ji aliyê heval, dilsoz û endamên hizbê û rêxistinên siyasî ve bi rêberiya hizbê û sekretêr gihîştine ku eyankerê hesta keyfxweşiya wan û nîşana dilsojiya wan e bo PDKÎ.**




Li vê derheqê de rêberî û sekretêr bi erkê xwe dizane sopasiya van hemû kes û aliyan bike ku bi şêweyek û bi her riyekê ve peyamên pîrozbahiyê şandine. Em bi çavê rêz û hurmet ve mêzeyî vê hest û dilsojiyê dikin û sopasdariya xwe bo wan xweştiviyan dubare dikin.

**PDKÎ/ Komîteya Nawendî**
**20’ê rezbera 1391 a rojî**

## Berdewamiya şewitandina daristanên derdora Merîwanê

**Cardin jîngeh û daristanên derdora Bajarê Merîwanê di nav agir de şewitîn.**

Nûçegehaniya Kurdpa ragehand ku roja 27’ê Rezberê, jîngeh û daristanên Gundên Qelacê, Sawcê û Dolebê ya ser bi bajarê Merîwanê ketin nava şewatê de û zirar û xisarên zaf gihaye xweza û jîngeha herêmê.

Çavkaniyek agehdar ji Encumena Kesk ya Çiyayên Merîwanê ragehand ku di 10 rojên derbazbûyî de eva cara şeşê ye ku şewat dikeva nava jîngeh û daristanên Gundê Dolebê de.

Li gor amarên fermî ên Encumena Kesk ya Çiyayên Merîwanê, rêjeya şewitîna daristanên herêmên Merîwan û Seholawa digije 173 caran.



www.rsw-kurdi.org

Hejmar 193, 22’ê Çiriya Pêşîn a 2012

# Wî tovî wê her ev berhem jê şîn be



**Ebdulla Hicab**

Diravê Îranê bi lez nirxa xwe li himber diravên xwedî hitbare cîhanî ji dest dide. Bazar baweriya xwe bi sozên dewletê nayne û kiryar û firoşiyar bi guman dikevin bazara kirîn û firotinê. Bihayê hewceyên rojaneye xelkê roj bi rojê zêde dibe û xuyaye ku kontrola dewletê bi ser abûriyê de gihaye asta herî nizim. Serêşa serekeye xelkê Îranê niha ewe ka gelo heya ku wê bikaribin taba wê rewşê bînin.

Xerabûna rewşa jiyana xelkê û tevliheviya ku îro li bazara Îranê serîhildaye, ne diyardeyek ecêb û ne jî bûyerek ji nişkave bû. Ev rewş encama siyaseta şaşe abûriye karbidestên Komara Îslamî ye ku her ji roja yekê ya deselata xwe ve siyasetek girtin pêşiya xwe ku jiyan û hewcedariyên xelkê pişt guhê xwe ve davêje. Ji ber ku, li gor danerê rêjîmê Xumeynî, xelkê Îranê şoreş nekir ji bo ku zebeşan bi dest bixin, an nanê wan erzan bibe, ewên ku wisan difikirin, çi cudahiyê di navbera mirovan û heyvanan de nabînin ... xelkê Îranê ji bo tiştek din şoreş kir û xortên xwe dane kuştin (jêder Sehîfeya Nûr, pirtûka 9 rûpelên 449-450). Rêrevên xumeynî û darêjerên siyaseta abûriye Komara Îslamî li ser bingeha wê nêrînê siyaseta abûrî datînin. Lewma ne ecêb e ku niha rewş gîhaye wê astê ku êdî bi rastî bihayê nanê rojane, û tenê nanê tirsî, ji bo gelek ji malbatên welat bûye serêşiya herî mezin.

Çavkaniya sereke ya pirsgirêka abûriye Îranê siyaseta giştiye rêjîmê û bi wê ve jî girêdayî siyaseta abûriye wê ye. Kontrola Sipah u Bunyadên girêdaî bi Xameneyî û Sipahê Pasdaran ve bi ser abûriyê de, pêşî girtin ji vegeşîna abûriya xwemalî, guhnedan bi pilansaziya li gor şiyan û viyana abûriye civakê, destbelaviya diravî di warên bêxêre weke pêşve birina îdeolojiya rêjîmê di asta navneteweyî de, lewçetiya siyasî ku dijkiryara tunde navneteweyî hildide himberî xwe û damezirandina bingehehek abûrî ku tu berhem nayne û tenê bikar tîne, hemû bûne heger ku rewşa niha serî hilde.

Lê di rastiyê de 3 faktorên; sîstema abûriye welat, siyaseta şaşe abûrî ya Ehmedînijad û dorpêç an herimandinên navneteweyî rewşa niha pêk anîne. Bi awayekê ku êdî niha ben ketiye qirka Komara Îslamî û bi wê riyê ve jî rewşa jiyana xelkê gîhandiye asta herî xirab.

Di destpêka deselata Komara Îslamî de, di gel şaşitiyên di warê siyaseta abûrî de, kontrola rewşê ji destê karbidestan derneketibû û jiyana abûrî bi her şêweya heyî diherikî, ji ber ku weke gotî “aşê nezanan Xweda digerîne”. Lê niha êdî tesma aş ji reşmê verisiyaye û Komara Îslamî bi astengiyekê re rû bi rû ye ku ne dizane û ne jî dikare xwe jê xelas bike.

Abûriye welat piştî guherîna rêjîmê li sala 1979/1357 tenê xwedî guherî, lê sîstema abûrî neguherî. Sermayedarên mezin hinekan bi sermayeya xwe ve û hinekan jî tenê bi malbata xwe Îran bi cî hêlan û bi xwe re zaniyariya li ser şêweya birêvebirina abûriyê jî derbasî derveyî welat kirin. Kargeh û sermayeya hinekan kete destê karbidestên nûye welat ku beriya hindê ku bi pisporiyê abûriya welat birêve bibin, ketin hizra hindê ka çawan berîkên xwe tije bikin.

Serbarî wê hindê jî karbidestên nû abûriya welat xistin bin kontrola kartêlên nûdamezirî ku li jêr navê Bunyadên cuda cuda, her yekê sîstemek abûriyê pêşve birin. Xala hevbeşe hemûyan ev bû ku piraniya qazanca ku li ber dizî û destpîsiya birêveberên nû dima didan dezgehên girêdayî bi rêberên olî yan Muctehîdan, ku ewan jî ew sermaye bi dilê xwe ji bo pêşve birina meremên xwe yên îdeolojîk bikar dianîn. Di encama wê siyasetê de, sîstema abûriye Îranê bû sîstemek tucarî û ji avakirina pîşesaziya bingehîn ku dikarî bibe binesaziya abûriya welat dûr ket.

Pir nekêşa ku bi kêmî 80% hemû dewlemendiya welat û diravê ku dirije bazarê, an kete destê karbidestan an jî bi riya wan re herikî bazarê. Kartêlên mezine girêdayi Sipahê Pasdaran û Bunyadên girêdayî Xameneyî hema hema bi yekcarî dest bi ser hemû warên abûrî de girtin.

Ew xwediyê tewaiya hînan û hinartina bo navxwe û derveyî welatin an yekser wê beşê kontrol dikin. Sipah û ev bunyad bi giştî li sê mijaran difikirin; bi destxistina bi leze dirav bêy ku sermaye razandibin, xurt kirina şiyana leşkerî ji bo pêşve birina armancên leşkerî û xurt kirina hevbir û hevrêbazên xwe li herêmê û cîhanê ji bo pêşve birina îdeolojiya Komara Îslamî.

Nîşaneyên xitimîna sîstema abûriye Îranê di dema serokkomariya Refsencanî de derketin. Lê ji ber ku hê daxwaziyên xelkê negîhabûn astek bilind û pêwîstiya welat kêmtir bi teknolojiya hevdem û emrazên pêşketî hebû, di heman demê de ji ber ku diravê belaşe neftê weke lehiyê dihate xizîneya dewletê, pirsgirêkên zêde derneketin. Refsencanî her wisan deriyê bazirganiyê bi ser derve de vekir û rê da ku hin sermayedarên pêşîn an vegerin Îranê an sermayeya xwe derbasî bazara Îranê bikin.

Piştî Refsencanî, Xatemî jî ew rêçik berdewam kir. Lê hêdî hêdî ew siyaset jî gîha xeta dawiyê. Di wan salên dawî de dema ew şêweya birêvebirina abûriya welat kete nava tengasiyê û xwe li himber deriyek nîvgirtî de dît, Ehmedînijad bû Bilqasim û bi ya xwe riya çareseriya tengasiya abûrî ji bo rêjîmê diyar kir. Li gor wî, pirsgirêk ne di sîstema abûrî de, lê di rola dewletê di birêvebirina abûriyê de bû.

Pilana sereke ya abûriye Ehmedînijad ev bû ku piştgiriya dewletê ji bo hin hewceiyên jiyana xelkê weke sotemenî, şekir û hin xwarinan bisekinîne. Li gor wî ev alîkarî dibû heger ku bihayê hin tiştan bi awayek destçêker li asta nişîv bimîne û abûriya welat nekare bikeve nava sîstema kêbirkêyê de. Lê wî dizanî ku qut kirina alîkariya dewletê ji bo wê beşa bazarê wê hemû civakê tevlihev bike. Lewma sîstema alîkariya malbatan ku bi xwe dibêjê “Yarane” ava kir. Lê ji ber ku ne qut kirina alîkariya dewletê bi bazarê re an sîstema sûbsîdiyan û ne jî alîkariya bi malbatan re li gor pilanek jêfikiriye abûrî bû, her du siyaset xitimîn. Êdî hem giranî zêde bû û hem jî sîstema Yaraneyan nekarî bersiva hevceiyên jiyana xelkê bide.

Li navxweyî welat baweriya xelkê bi sîstemê nema. Dijberiyên ku pêştir ji ber sedemên siyasî û li deverên derveyî bazneya deselatê ji ber sedemên neteweyîi xurt bûn, wê carê ji ber hegerên abûrî dubare serî hildan. Lê rêjîmê pir zû bi alîkariya dezgehên serkutker nerazîbûnên nava civakê fetisand. Her çend ew dijberî û nerazîbûnane bi dawi nehatin, lê rêjîmê tu derfet neda ku aliyên nerazî xwe bi rêkxistin bikin an bikevin pêşbirkêya siyasî. Li aliyek din ve baweriya bi bazarê jî nemabû. Êdî dema bêbaweriya bi bazarê, sîstema abûriye welat û dijberiya bi rêjîmê re gîhan asta herî bilind, asayî bû ku sîstema abûriye welat bikeve ber babelîska qederê.

Serbarî wan şaşitiyan, siyaseta derveye rêjîmê jî hem bo civakê û hem bo abûriya welat bû bela. Komara Îslamî li ber serhişkiya ku di siyaseta derve de dimeşîne û piştgiriya xwe ji bo alî û hêzên dijdemokratîk ku piraniya wan bi riya tundutîjî û terorê siyaseta xwe pêşve dibin, beşek ji sîstema cîhanî jî bi xwe re kiriye dijber. Piraniya welatên Rojavayî û bi taybet Amerîka wê siyaseta Îran ji bo berjewendiyên xwe yên herêmî û cîhanî asteng dizanin.

Lê ji hemûyan bi meraqtir Îsraîl e ku gef û siyaseta zêdegave Îranê li herêmê ji ewlekarî û pêşeroja xwe re gefek mezin dibîne. Lê Îran baş dizane ku di rewşa aloze îroye cîhanê de, renge hêzên dijbere wê nekarin bi hêsanî bêne ser. Ji ber wê hindê hindî li destan bê, siyaseta xwe ya li ser bingeha alozî, şer û şiltaxiyê hatî damezirandin pêş ve dibe.

Di rewşek wisan de tenê emrazê ku Rojava dikare niha li hember Îranê bikar bîne, zextên abûriye. Bi wê mebestê heya niha çend xelekên herimandinên abûrî danîne ser Îranê ku embargoyên wê dawiyê yên herî bi karîgerî bûn. Bi taybet guwêşên li ser sîstema bankê û wê dawiyê jî biryara Yêkitiya Ewrûpa ji bo pêşîgirtina kirîn û firotina keresteyên beşa neft, gaz û enerjiyê zêdetir çavên rêjîma Îranê zil kiriye. Bi awayekê ku berdewamiya wê rewşê dikare qedera rêjîmê biguhere.

Niha kontrola dewletê bi ser bazarê de gîhaye asta herî nizim, diravê Îranê roj bi roj pitir bênirx dibe, bihayê hewcedariyên jiyana xelkê her tê û zêde dibe û dahata xelkê an her li ciyê xwe sekiniye an hê pitir daketiye. Bi kurtî abûriya Îranê weke reniya devbiharê ku her rojê egera şimitîna wê heye, li ser lêva Kendal e. Ya ku ciyê metirsiyê ye ewe ku ew renî beriya ku sîstema siyasî bi xwe re biherifîne, rewşa jiyana xelkê bi awayekê serubin bike ku civak bi salan nekare li bin barê wê zextê de, pişta xwe rast bike.




www.arsivakurd.org

# Kuştina kasibkarên kurd, pîlanek darêtî!



Efşar Ceferî

Di vê meha derbasbûyî de, li bajarên Rojhilatê Kurdistanê û li gor çapemeniya kurdî, herî kêm 10 kasibkarên kurd bi êrîşa rasterast a hêzên leşkerî yên Komara Îslamî ya Îranê ve hatin kuştin û çendîn kasibkarên din jî hatin birîndarkirin. Ev ne pêvajoyek nû ye ku mirov pê re şaş bimîne, ji ber ku 33 sal in ku jiyana gelê kurd li Kurdistana Îranê di bin siya desthilatdariya Koma ra Îslamî de bi zordestî, kuştin, îşkence û darvekirinê dibihure. Lê tişta ku mirov matmayî dike ev e ku çawa û çima heta niha kuştina rojane ya kasibkarên kurd dom dike?

Ciwanên kurd ên ku rojane di cilên kasibkariyê de li ser



sînorên Kurdistanê jiyana xwe ji dest didin an tên birîndarkirin, ev pîşe û kar ne li gor xwesteka xwe hilbijartine ku ev jî rêya mirin û jinavçûna wan e. Belkî rewşa aborî û civakî û siyasî ya herêmên kurdan ew neçar kirine bo derbara jiyana malbatên xwe, dest bi vî karê dijwar û pirr xeter bibin. Ciwanên kurd wekî ciwanên neteweya serdest li bajarên din ên Îranê ku rewşa wan gellekî baştir e, xwedî şiyana xwendina bilind û karînên corbicor in ku dikarin di rêveberiyê de bikar bînin, lê mixabin tu derfetek wan tuneye ku wê hêza xwe di kar û pêşeyên normal de bikar bînin.

Zêdeyî 30 salan dibe ku para ciwanên kurd li Îranê, qebûlnekirina nasnameya neteweyî, bêpariya aborî, civakek mîlîtarîzekirî û bêkarî û nebûna derfetên kar û jiyanek normal e. Ev rewş ji siyasetên Komara Îslamî ya Îranê li Kurdistanê çavkanî digire ku heta niha jî tê meşandin. Li herêmên Rojhilatê Kurdistanê tu navend, şîrket û karxaneyên hilberîn û senetî tu ninin ku ciwanên kurd têde kar bikin û dûrî jiyana dijwar û şevên tarî li ser sînoran debara jiyana xwe bikin. Kurdistan deverek xwedî atmosferek taybet e ku ji bo cotkarî, ajeldarî û baxevanî û dehan pîşeyên din pirr hêja û têrber e. Lê mixabin hikûmet tu îmkanat û alîkariyekê bi wan senfan li herêmên kurdan nake ku heta beşek ji hevwelatî bikarin bi vê rêyê bijîva jiyana xwe normal bimeşînin. Bêkarî û nebûna derfetên kar li Kurdistana Îranê li gor karnasên aborî û civakî, bêhtirî ji sedî 40`ê ye ku gefek mezin e li ser jiyana civakî.

Beşek ji ciwanên kurd neçar in ji ber vê statuya xerab, ji bo peydakirina kar biçin deverên din ên Îranê ku îmkanên wan pirr zêdetir in. Beşek jî mecbûr dimînin li herêmên xwe bimînin ku ji ber nebûna kar, karê kasibkariyê li ser sînorên Kurdistanê dikin. Ev yek ji ber neçariyê ye û ne tiştek hilbijartî û dilxwazane ye. Ti kesek naxwaze ji ber bijîva jiyanê bê kuştin, birîndarkirin û girtin, lê li Kurdistanê ev bûye diyardeyek normal a jiyana hevwelatiyan. Gellek carr li nav bajarên Kurdistanê jî, hevwelatiyên kurd bi bahaneya hebûna barên qaçax di nav otombêlên wan de tê gulebarankirin ku ev yek dûrî hemû rêbazên mafê hevwelatîbûnê ye û binpêkirin û destdirêjiya eşkere ye bi ser mafê mirov û jiyana civakî. Di van bûyerên wiha de, dozvekirin û şikayetnameya hevwelatiyên kurd jî bê feyde ye û ti dezgeh û saziyek tune ye ku berevaniyê ji wan bike. Ji ber ku Kurdistan mîlîtarîzekirî û ewlekarîkirî ye, her bûyerek kuştin û birîndarkirina kasibkarên kurd û hevwelatiyên sivîl bi asayî tê nirxandin ji aliyê dezgehên hikûmetê ve. Dema hevwelatiyên kurd dozê li dijî hêzên êrîşker ên dewletê vedikin, dibêjin me xerabkarek kuştiye! Loma niha herî kêm malbat doza kuştina zarokên xwe dişopînin. Ji ber ku kes lêpirsînê li kuştina wan nake êi hemberî hêzên dewletê. Kuştina mirovekê di civakek demokratîk de şokeyê pêk tîne û rojevê dihejîne, lê li kurdistanê kuştina çendîn hevwelatiyên sivîl û bêguneh di rojê de kesî şoke û ecêbmayî nake!

Êrîşkirin û kuştina kasikarên kurd li ser sînorên Kurdistanê ne karek heq e, ji ber ku rayedar sebebê hebûna kasibkariyê ne li Kurdistanê. Ger berpirsiyarên Komara Îslamî ya Îranê derfet û îmkanên karê normal pêk bînin ti ciwanek kurd amade nabe ku kasibkariyê bike, lê ger vî karî jî nekin, jiyana wan nameşe û ligel dehan pirsgirêkên ciddî rûbirû dibin.

Ez bawer im ku kuştina rojane ya kasikarên kurd li ser sînoran, pîlanek darêtî û bi bername ya hêz û dezgehên dewleta Îranê ye ku bikarin pirr hêsan ciwanên kurd bidin ber êrîşa guleyên xwe û her roj xwîn bê rijandin û behî û serxweşî li Kurdistanê hebe û dayîkan bişewite. Lê ger ne wisan bûya, rayedarên dewletê dikarîn di çarçoveya projeyên aborî û senetî ku li herêmên Farsaxiv de dikin, vê diyardeyê li Kurdistanê ji nav bibin û hevwelatî neçar nebin rêya dijwar a kasibkariyê bigirin pêşiya xwe.

# 12 milyon dolar bo eşkerekirina cihê du terorîstan

**Wezareta Karê Derve a Amerîkayê di daxûyaniyekê de, 12 milyon dolar li hember eşkerekirina ciyê du endamên Elqaîdê wek xelat diyarî kir, ku li gorî vê daxûyaniyê, ew di Îranê de akincî ne.**






Li gor rapora Radyo Ferda, ev du kes bi navên Mohsin Elfezlî berpirsyar û Adil Rezî Sedr Elwehabî Elherbî cêgirê navbirî, niha di Îranê de akincî ne.

Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê ragehand ku tora Elfezlî li dor şandina hêza çekdar û alîkariyên malî bo hêzên ser bi Elqaîdê li Sûriyê de dixebite, û herweha ragehand ku Elfezlî yek ji kesatiyên cihê baweriya Elqaîdê ye ku agehdarî êrîşa 11'ê Septambrê û herweha di êrîşa 6'ê çiriya Pêşîn a sala 2002'an, bo ser keştiya Feransî li qirax avên Yemenê de bûye.

Navbirî di meha Şûbata sala 2005'an, ket nava listeya tehrîmên Amerîkayê û roja pêncşemiyê jî cihgirê navbirî ket nava lîsteya reş ya Amerîkayê de.

# Besîcî ji tirsê serhildanên navxweyî xwe amade dikin

**Dawî beşa manora 15 hezar kesî ya Sipaha Pasdaran a Komara Îslamî li jêr navê “Ber bi Bêytolmoqedes”, li Tehranê birêve çû, û Gordanên “Wakonêş Serîi” ya Besîc, dest bi encamdana temrînên nav bajar de kirin, bona vê ku heke serhildanek ji aliyê xelkê vê pêk bê, wan amadeyiya tepeseriya bilez hebe.**

Nçûçegehaniya Fars ragahand ku roja Înê, 28'ê Rezber, gordanên Hêza Besîc di manora xwe de li heşt nuqteyên Tehranê de, amadeyiya xwe li hember her gefeke emniyetî, emeliyatên aramkirina rewşê, paksaziya menteqê û emeliyata serbest berdana dîl û êxsîran nîşan dan, û di dawiya manora xwe de jî rabûn bi encamdana rêjeya bi matorsîklêtan.



# Komara Îslamiya Îranê hate dadgehîkirin



**Piştî birêveçûna serkevtiyane a qonaxa yekem a dadgehîkirina Komara Îslamiya Îranê li Lendenê de, qonaxa duyemîn jî bo heyamê sê rojan ji 25 heya 27'ê Oktoberê wê li bajarê Lahe de birêve here.**

Kombûnên vê dadgehê hemû rojê ji saet 9'ê sibê heya 5:30'ê êvarê bi dema Ewropaya nawendî û 11:30'ê sibê heya 8'ê êvarê bi dema Tehranê, rasterast ji kanala esmanî ya jêr tê bilavkirin.

Hotbird 1147 ver 27500 5/6

Weşana rastexwe li malpera Îrantirîbonal de jî wê hebe.

www.irantribunal.com

# Şoreşgerê rûken, Dr. Sadiq Şerefkendî



Memo Şahin

Min însanek naskir; rûken, nazik, dilsoz, dilgerm û ji dil dost.

Bîst sal derbaz bûn. Bîst payîz bihorîn, bîst car bihar hat. Dar dîsa bişkivîn, kolîlk dîsa vekirin, xweza xemilî. Dem bû payîz, xemgînî belav bû, di xwezayê de, di jiyana Kurdan de.

Bîst sal derbaz bûn, nifşek nû, neslek nû gîha û mezin bû. Bi hezaran, bi dehhezaran Dr. Saidên nû ala Şerefkendî hildan û bilind kirin.

Sala 1992'an bû. Bona hilbijartinên başûrê Kurdistan bi heyetek ji parlamenter û rojnamevanên Alman ve rêketim ber bi Başûr. Ew li ser Tirkiyê çûn, ez jî li ser Sûriyê û rojavayê Kurdistan.

Min Qendîl wê çaxê naskir, di Gulana 1992'an de. Min Hizba Demokrata Kurdistana Îranê nasdikir. Lê ew ji dûr ve bû. Min Hizba Demokrat, rêber, kadro û peşmergeyên canfeda li Qendîlê naskir. Ez bûm mêvanê Dr. Seîd, nemir Sadiq Şerefkendî. Tim rûken, tim dilsoz, tim nazik û tim dost ji dil.

Min nanê Dr. Seîd xwar, bûm mevanê wan. Qendîl, şûn û cihê baregah, meqer û deftera siyasiya (Politbûro) Hizba Demokrat. Min dilê xwe hişt li Qendilê, bîst sal berê.

Destpêka Îlona 1992'an de bû. Wê carê jî Dr. Seîd hat Almanya û bû mêvanê min. Bi hevra bûn, çend roj. Ne tenê bû; li cem nûnerê Ewropa Fettah Ebdulî, nûnerê Almanya Humayûn Erdelan û çend hevalên din.

Me nan xwar. Paşê dema razanê hat, me cihên razanê amadekir. Got "cih ne hewce ne. Em ê li ser xaliçeyê (mafûr) razên. Tenê bettaniye lazim in." Me çi kir, nekir qebûl nekir û li ser xaliçeyê dirêj bûn, razan hemû bi hevra.

Paşê bo çend hevdîtinan çû Îskandinavyayê. Û di dawiyê de vegeriya Berlînê, bo beşdarbûna Kongreya Enternasyonala Sosyalîst.

Hên li Kolnê bû, min bo parastinê pêşniyar kir. Got "tiştek nabe. Em mêvanê Almanya ne û tiştek jî ne hewce ye."


Kongreya Enternasyonala Sosyalîst destpêkir. Me carek din li Berlînê, di cîvînê de hevdû dît. Heyata Kurdan rengîn bû: Mam Celal, Hoşyar Zebarî û çend kesatiyên din.

Min li Berlînê jî peşneyar kir û got, ''kerem kin, werin li mal bimînin, hotel ne baş e.'' Bersiv de û got: ''Hemû heyet li hotelê dimînin. Em dikarin li wê hevdîtinan pêkbînin. Wekî din jî li hotelê polîs hene.''

Roja dawî bû, civîn di 17'ê Îlonê xelas bû. Min xatirê xwe xwest û ber bi Kolnê rêketim. Otûban tijî û xetimî bû. Trafîk nedimeşiya. Bi saetan li rê mam. Di dawiyê de li Magdebûrgê min telefona Berlînê kir û min got ez vedigerim, rê tijî ne. Xwîşka min bi dengek kelegirî, xebera reş gîhand min. Got "Dr. Seîd hat şehîd kirin."

Dest û rûyê min cemidîn. Vegeriyam bi lezek gelek zêde. Sibê jî hevalên Hizbê hatin ji Parîsê. Ber ku bi zimanê Almanî nedizanîn, wekalet dan min, bo hemû kar û barên hewce û brûkratîk. Pêwist bû, yek ji me bikeve morgê, bo tespîta cenazeyan. Ketim morgê bo teyîdkirina şexsê wan camêran. Êşek ket dilê min, bîst sal in dernaveke.

Me cenaze di roja 25'ê Îlonê bi merasîmek mezin



rêkir Parîsê, lê Fransa vîze neda min. Bi qaçaxî derbaz bûm Fransayê û ûsa jî beşdarê merasima cangoriyan bûm.

Bîst sal in her sê cangoriyên Kurdistanê li Parîsê ne, li cem nemir Dr. Qasimlo. Hemû jî bi destên rejîma Îslamî ya Îranê hatin terror kirin, di nav Ewropayê de. Qatil û bikuj hatin girtin, ceza dan wan. Lê ji ber berjewendiyên aborî, Almanya piştî mideheke bikuj teslîmê Tahranê kirin. Niha serbest û azad in bikuj û qatil, wek ya Dr. Qasimlo.

Almanya, Avusturya û bi temamî Ewropa deyndarê me Kurdan in, ji sed salî vir de. Ewropa durû ye, exlaq û wijdan di berika wan de ye.

Encama îhmalek biçûk, gelek giran bû. Rêberên Kurd li dû hev hatin kuştin, di paytextên Ewropayê.

Rejîma Îranê dixwest bi dardakirina Pêşewa Qazî Muhemmed, bi kuştina Dr. Qasimlo û Dr. Seîd û hevalên din şoreşa rojhilata Kurdistanê bê serî û rêber bihêle û ûsa jî ji pirsa Kurd xelas be. Bi hezaran û dehhezaran Kurd ji aliya rejîma Îranê ve hatin girtin, di bin îşkenceyên zalimane de derbaz bûn. Bi hezaran Kurdên welatparêz hatin kuştin, bi sedan hatin dardakirin, wek Şîrîn Elemhulî û Ferzad Kemanger. Lê ev hêsab neçû serî. Niha jî pêşmerge û gerîlla li rojhilatê Kurdistanê berxwe didin û ala wan lehengan bilind dikin.

Niha parçeyek Kurdistanê azad e, perçeyek din jî bi hemû hêz û leza xwe ber bi azadiyê ve dimeşe. Ne dûr e ku arzûmendiya Dr. Seîd bê cih û Rojhilat û Bakûrê Kurdistanê jî çarenûsa xwe bigrin destên xwe û qedera xwe bi xwe diyarî bikin; Kurd serwer bin û Kurdistan jî azad.


Min însanek naskir, bû kekê min. Cihê te bihûşt, axa te nerm be, Şoreşgerê Rûken, kekê min ê hêja, Dr. Seîd. Min bêriya te kiriye, dilsozê welat!

## Mensûr Erbab îtilaf bi hewla terorîsî a xwe kir

**Mensûr Erbab hemwelatiyê Îranî Kanadayî ku derheq hewildana bo terora balyozê Erebistana Seûdî bi alîkariya Sipaha Quds a Îranê hatibû tometbarkirin, bixwe îtiraf bi vê hewildanê kir.**

Li gorî nûçeyan, navbirî li bersiva dadwer Can Kînan de ku jê pirs kiribû: " Gelo ew yek rast e ku we ji nêzîkî Buharê heya payîza sala 2011'an di gel hevkarên xwe ku berpirsyarên komara Îslamiya Îranê bûn, hewil daye ku balyozê Erebistana Seûdî teror bikin?". Wî jî bersiva erênî daye vê pirsyara dadwer.

Hukmê dadgehê roja 23'ê Janwiyê wê bê derkirin û renge navbirî aliyê zor bi 25 sal hepsê were mehkumkirin. Navbirî li meha Septambera sala 2011'an li balafirgeha Can Êf Kênêdî li Niyoyorkê de hate destbiserkirin.



## Beşar Esed ji aliyê Sipaha Pasdaran ve tê parêzvanî kirin

**Çavkaniyên dîplomatîk ragehandin ku Beşar Esed serkomarê Sûriyê li wan mehên dawiyê de ji tirsê terorê, garda parastina xwe guherî ye û di ciyê wan de endamên Sipaha Pasdaran daniye.**

Li gorî çavkaniyên dîplomatîk pêştir Elewî di nav vê garda parastina serkomar de bûn.

Lê ew biryara Beşar Esed li ser bingeha pêşniyara nûnerê Sipaha Pasdaran li Sûriyê wate Husên Hemedanî bûye ku navbirî ketiye nav rîzbenda wan berpirsyarên Îranî ku



ketine ber tehrîma rojavayiyan.

Pêştir rejîma Îranê ragehandibû ku ew tenê di warê rawêkirinê de alîkariya nizama Sûriyê dikin, lê her roj belgeyên nû di vî warî de derdikevin.

www.arsivakurdi.org

# Gola Urmiyê hêdî hêdî dibe şorekat



Moitesem Nûranî



Gola Urmiyê mezintirîn gola navxweyî a Îranê û duyemîn gola sûr (şor) a cîhanê ye. Gola han li bakûrê rojavayê Îranê de hilketiye, bi awayekê ku sînorê rojhelatê Kurdistanê ji hêla talog a gola Urmiyê re derbas dibe. Herweha piraniya bajarên kurdakincî ên Kurdistana Îranê cîranê vê behrê ne.Bajarên weke Selmas, Urmiye, Pîranşehr, Şino, Nexede, Mehabad û Miyanduav dikevine rojava û başûrê rojavaya vê golê.

Nemaze beşa herî zaf a ava behra Urmiyê ji rûbarên Kurdistanê weke: Cexetû, Tetehû, Gader, rûbarê Mehabadê, Nazlû, Berandêz, Şeher çay û Zolaçay pêk tê. Hêrodêt li pirtûka xwe de basa qewmek bi navê Matîno dike ku li derdora vê golê de jiyan kirine.

Ew nav ji Mantiyane nizîk e û Mînoriskî dibêje Mantiyane heman Manahay yan Mad in ku li derdora gola Urmiyê û devera zagrosê de jiyane. Pûrdawûd jî nivîsaniye ku gola han bi navê yek ji giravên çiyayî hatiye binav kirin ku jêre dibêjin gola Şahî, ku heman Şaho ye û ji madan ve bi cî maye.

Gola han li warê pêgeha cuxrafiyayî li deverek şaz de hilketiye ku dîmen û ciwaniyek taybetî daye deverê. Him li warê seqa û him jî li warê xwezaya Kurdistanê cihek bixeml û dilrevîn e. Her ji kevnar ve av, lîm û lîteya vê golê li biyava pizîşkî de qazanca wê hebûye. Xelik ji dûr û nizîk ve bi taybetî li dawiya bihar û germiya havînê de him bi merema geştiyarî û him bi merema çareseriya nesaxiyan hatine derdora vê golê.

Çûnku him ava wê, him jî lîm û lîteya devbehrê ji bo çareseriya gelek nesaxiyan weke ya jinan, perasûyan, hestî û nesaxiyên kewil û bawesêriyê mifah jê tê standin.

Her ji kevnar ve gola han bi behra xwê hatiye nasîn. Ava wê yekcar sûyr e. Bi awayekê ku rêjeya xwê a wê nizîk bi 180 heya 220 gm li lêtrê de ye. Lê niha ji ber kêm bûna ava golê û tîratiya ava wê rêjeya xwê a wê gihaye 400- 450 gm li lêtrê de, bi qasekê ku ava wê kirîstalîze bûye. Tevî wê jî daketina ava golê bûye sedem ku 5 giravên vê behrê tevlî hişkatiya derdorê bibin. Gola han ji ber ku sûyr e tu jîndarek ji bilî Artimya têde najî ku xwedî nirx û buhayek zaf e.

Bi jinavçûna wan giravan zirar û ziyanek zaf bi heywanên kêwî gihîştiye. Ji ber ku li warê sirûştî û ekosîstem da rewşek gelek xirab û tirajidîk bi xwe ve girtiye. Çunku bi baldan bi rewşa xwezayî û jordeçûna pileya germê, jordeşûna rûniştiyên cîhanê, jiyana maşînî, gaza CO2 bûye sedema guhertinên kûr li ekosîtemê de.

Yek ji deverên avî, hesas û hestiyar ên Îranê, gola Urmiyê ye ku ji ber kêmiya baranê û hişkesaliyê, herweha çêkirina avbendên zêde li ser rûbaran, kulandina bîr û çalên avê li derdora behrê, afirandina riya Kelanterî li navqeda behrê û girîngtir ji hemûyan xemsariya karbidestên dewletî û birêveberiya nebaşe wan wusa kiriye ku ava vê golê roj li pey rojê ber bi hişikbûnê ve biçe. Çûnku her niha zêdeyî %70 a ava golê hişik bûye û ger pêvajoya han dirêjî hebe heya çend salên din bi yekcarî hişik dibe.

Bi hişikbûna gola Urmiyê ne tenê xelkê Urmiyê, belkî hemû xelkê Îranê dê zerermend bin û zirarek zaf bi daristan, rez û baxan, kiştukal, pez û malat, giya û jîndarên deverê bigihîje û bi milyonan ton xê bibe bi toz û ba û bi ser deverê de bibare û dê bibe deştek hişk û şorekat û ew bedevil û dîmena bixeml a sirûşta Kurdistanê ji nav diçe.

Vir de erkê hemû part û rêxistinên civaka sivîl û çalakvanên mafên mirov e ku jib o rizgarkirina gola Urmiyê daxwaz ji rûniştiyên bajarên derdorê bikin ku bi lidarxistina mangirtin û xwenîşandanên aştiyane, karbidestên rejîmê neçar bikin ku hawriyekê ji gola Urmiyê bidin û ji bona rizgar kirina gola Urmiyê û mifahstandin ji alavên modern û darêtina pilanên guncaw û bilez pêşiya hişikbûna golê bigrin.

Ji ber ku eva pirsek gelek girîng e. Jînge û jînge parêzî li serdemê îro de yek ji basên girînge rojê ye. Ji ber ku bi hişikbûna vê deryayê rêjeyek berçav a xê bi cî dimîne ku eger û metirsiya sonamiya xê ne tenê bo Îranê, belkî zirarên wê bo welatên cîran jî heye, lewre dibe em tev de jêre nîgeran û xembar bîn û kar jêre bikin.

## Sikotlendî wê biryarê li ser mafê çarenûsa xwe bidin



**Serokwezîrê Brîtaniyayê û serokwezîrê Sikotlendê peymaneke gelek girîng îmze kirine û li gorî vê peymanê herdu aliyan biryar daye ku di sala 2014'an de gelê Sikotlendê biryarê li ser serbixweyiya xwe bide.**

Piştî nakokî û aloziyeke zêde di navbera Skotland û Birîtaniya de li ser mijara encamdana referandumê li Sikotlendê ya ji bo destnîşankirina çarenivîsa vê herêmê, serokwezîrê Herêma Sikotlendê û serokwezîrê Brîtanyayê di warê pêkanîna referandomê de li hev kirine.

Li gor vê rêkevtinê Birîtaniya razî bûye ku di sala 2014'an de, referandum li Sikotlendê bê pêkanîn ku xelkê vê herêmê biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin.

Hêjayî gotinê ye ku Yekîtiya Sikotlendê û Birîtaniyayê di sala 1707'an de pêk hatibû.

## Sûriye bi desthebûna di teqîna Beyrûtê de hat tometbarkirin

**Di teqîna roja Înê a Lubnanê Serokê Servîsa Îtilaata navxwe ya Lubnanê hat kuştin**

cenêral Vîsam Hesen ku di teqînê de canê xwe ji dest da, kesatiyek nêzîk ji Seid Herîrî, rêberê opozisyona Lubnanê û yek ji dijberên rejîma Demişqê bû.

Seid Herîrî Kurê Serokwezîrê berê yê Lubnanê ku 7 sal berî niha di teqînek weha de canê xwe ji dest da, serkomarê Sûriyê bi kuştina Serokê Dezgeha Ewlehiya Navxwe ya Lubnanê tometbar kir.

Li gor gotinên berpirsyarek polîsê Lubnanê, armanca teqîna meydana Sasîn a Bajarê Beyrûtê ku Mesihî tê de akincî ne, Jiniral Vîsam Hesen bûye. Welîd Cûnbelatê rêberê Diroziyên Lubnanê jî ragehand ku tu gumanek têde nine ku rejîma Beşar Esed li pişt teqîna Beyrûtê ye.

Herweha siyasetmedarên dijberê Sûriyê li Lubnanê û civata Ewlehiya rêxistina NY jî, Teqîna Beyrûtê weke kiryarek terorîstî mehkûm kirin.



www.arsivakurd.org

# Dîsan destûrnameya şer!



Şehab Xalidî

Çend rojan berî niha dîsan li ser daxwaza serokwezîrê Turekiyê parlementoya Turkiyê li hev civiya, û li ser dirêjkirina operasyonan dengdanek birêve çû ku her sê partiyên AKP, CHP û MHP dengê erênî dane destûrnameya şer.

Lê parlemeterên Kurd li hemberî vê helwesta her sê partiyan de dijkiryarek tund ji xwe nîşan dan û bi eşkere ragehandin ku dubarekirina tecrubeyên şikestxwarî nezanî û ehmeqî ye. Tenê rêçare ew e ku diyalog di navbera aliyan de dest pê bike.

Di rastî de tewaya hewla dewletê ew e ku pirsa Kurd bi dana dirûşmên bê bingeh bitemirîne. Dewleta Turkiyê ku berdewam bas ji çareseriyê dike niha dixwaze ji aliyekê ve bi êrîşên li ser PKK û ji aliyek din ve bi baskirina ji çareseriya pirsa kurd weha nîşan bide ku Kurd li Turkiyê de ji hêzên xwe yên pêşeng cuda ne.

Siyasetek ku bê guman tenê bûye sedema berdewamiya şer û tundûtujiyê û nekariye bersiva erênî bide.

Heya niha çendîn carî PKK bona nîşandana amadeyiya xwe ji bo çareseriyê agirbes ragehandiye, û ew agirbes heke du alî baya, bê guman wê di warê çareseriyê de hinek pêngav bihatiban avêtin.

Lê dewletê ne tenê agirbes ranegehandiye û heke carekê ragehandibe jî, bixwe ew agirbes şikandiye, wan agirbesan vedigerîne ser lawaziya PKK û berdewam wan girupek terorîst dihesibîne, ku her ew yek nîşan dide ku dewlet li pey çareseriya pirsa Kurd nagere, û jêre çareser nekirin û poan nedan biqazanctir e heya çareserî.

Bi raya min heta CHP jî ku heyamek berî niha bas ji amadekirina nexşeriya çareseriyê bo pirsa Kurd dikir bi vê helwesta xwe nîşan da ku her wek pêştir ew partiya herî şovenîst û dijî Kurd in, û tenê bona rakêşana dengê Kurdan bo aliyê xwe ye ku carna wan pîlanan bikar tînin.

Ew Kurdên ku di nav wan partiyan de jî cih digrin dibe bizanin ku îrorojê bi her helwesteke wan partiyên ku ew di nav de cih digrin, mebesta min helwestên li ser destûrnameya şer e, ku dibe sedema domandina şer û rêtina xwîna bi sedan ciwanên Kurd, ew ciwanên ku ji bo aştî û demokrasiyê, ji bo sitandina mafê xwe yê zewtkirî ji aliyê hikûmeta Turkiyê ve, ji can, mal û jiyana xwe bihurîne. Dibe di vê qonaxa herî hestiyar de ku pirsa Kurd êdî bi tu awayî binax nabe, her kurdek ji aliyê xwe ve, vîjdana xwe bo demek kin jî be, bike qazî û biryara xwe bide.

Yan li hemberî vê hemî cînayeta ku rojane li jêr sîbera deshilata AKP'ê de tê encamdan bêdeng nemînin, yan jî aliyê kêm heke bêdeng dimînin li hemberî birayên xwe de ku canê xwe ji bo Kurdistanek azad gorî dikin tevlî pîlanên rengbireng yên AKP nebin. Jiber ku heya Kurd zêdetir li nav dem û dezgehê wan partiyê şovenîst de cih bigrin û li derkirina biryarên wek destûrnameya şer de bi wan re alîkar bin, gellek asayî ye ku ew dê berdewam bin li ser oporasyonên qirêj û yê hêzên Kurd wek terorîst û xwe jî wek nûnerên Kurdans bihesibînin û dê weha nîşan bidin ku tenê ew in ku dikarin nûneratiya Kurdan bikin.

Bi her hal her çavan ku li parlementoyê de parmenetera Kurd Sureya Onder got: "Dubarekirina wan tecrubên pêşîn ên têkşikestî, ehmeqiyek tewaw e". Tenê riya çareseriyê jî ne diruşmên rengbireng ên Erdoxan û hevhizrên wî, belkû pêngavhilgirtina bi kiryar ji bo ragirtina şer û destpêkirina gotûbêjan li gel nûnerên rasteqîne ên gelê Kurd li vî welatî de ye.

Ji bilî vê riyê baskirina ji çareseriyê li çarçoveya diruşman ji aliyê dewletê ve û terorîst hesibandina hêzên Kurd, tenê û tenê bo duberekî û nakokî xistina nav Kurdan de ye, û dibe gelê Kurd gellek hişyar û serwext û yekgirtî bin, jiber ku bihêzbûna wan li yekîtiya wan de ye, û ew yekîtiya xurt e ku dikare dewletê neçar bi paşvekêşê li hemberî êrîşan de bike.




## Rojev

## Senaryoya Sipahê li dor daxistina gewriya Hurmizê çiqas dikare bikewe warê piratîkê?

Selîm Zencîrî

Heftînameya "Spiegel" a Alman, roja 14'Çiriya pêşîn li raporek xwe de îdea dike ku Sipaha Pasdaran a Îranê armanca xerabkariyê li Xelîcfarsê de heye û dixwaze ku bi pêkdadanek sexte û bin av kirina neftkeşekê, gewriya Hurmizê dabixîne.

Pêka ku li vê pilanê de hatiye texmîn kirin, piştî bin av bûna gemiya neftê, riyên navnetewî dê bên daxistin û welatên baykotkar ên li dijî, Îranê dê tûşî zirar û cezayan bibin.

Ji hêla din ve ji ber rêjeya zaf a pîsbûna ava xelîcê li dor têkçûna gemiya neftê, dê tirajîdiyek jîngehî pêk were. Helbet li egerek wusa de Îran jî parastî nabe û hemû avên başûra Îranê jî dê pîs bibin.

Seîd Mehmûdî, karnasê mafê deryayan vê kiryara Îranê bi awayek ji xwekujiyê dizane ku renge pitir ji her welatek din zirarê bigehîne xwe.

Helbet ew hêvîdar e ku piştî eşkerekirina pilana han ji aliyê kovara "Spiegel" ve, bûyera han tu car naqewime. Ji ber ku taze pilana han hatiye eşkere kirin û eva jî tê wateya wê ku li piratîk de birêve birina pilanek wusa ji nav çûye, çûnku paşan înkara wê dê gelek dijwar be.

Ger welatên zirardîtî bikarin biselimînin ku ew kar berqesd bûye, li warê yasayên navnetewî de destê wan vala ye ku ji her alavekê bona vekirina dubare ya gewriya Hurmizê mifahê bistînin. Çûnku li dîtingeha mafê navnetewî ve, avriyên navnetewî dibe bi awayek berdewam bona hat û çûyîna gemiyan vala û vekirî bin. Li egera selmandina wê de, pirsa han dikewe çarçoveya gefên li dijî aştiya cîhanî û dikare bo Şêvra Ewlekar were şandin.

**Aloziyên deverî reaksiyona herî biçûk a daxistinê**

Hûşeng Hesenyarî, mamostayê Kolîja Leşkirî a Kanadayê îşare bi manora dawîn ya 22 welatan li Kendavê de dike û tekez li ser vê yekê dike ku armanca sereke ya manovrê, paqijkirina mîn(mayîn)an û pêşgirtin ji daxistina gewriya Hurmizê ye.

Herweha dide zanîn ku ev senaryoya ferzî a Sipahê dê bi reaksiyon û helwesta herî tund a welatên din re berbirû bibe û ew dijkiryar ne tenê dê hewildan ji bo vekirina Hurmizê be, belkî dikare bibe sedema ber bi rûbûna bi Sipaha pasdarn û bi awayek giştî bi rejîma Komara Îslamî re û eva jî dikare aloziyê li deverê de pêk bîne.

Li dor bandora rûdana egerek wusa bo welatên hewcedarê neftê jî dibêje ku" pêka berhevdanên ku Amerîkiyan kiriye, karek wusa dikare heya mehekê gewriya Hurmizê dabixîne. Lewre ye ku welatên deverê hewil dane ku riyên din weke alternatîv bona şandina neftê bibînin. Li rewşek wusa de bêguman nirx û buhaya neftê wê jorde biçe û dever jî aloz bibe. Lê ew daxistin ne dayimî dibe û ne jî dibe sedema fetisandina aboriya welatên hewcedarê neftê.

**Daxistina Gewriya Hurmizê ragihandina şer bi cîhanê re ye**

Pêka rapora "Spiegel", ji ber pîsbûna ava kendavê li encama bûyerek wusa de, welatên rojavayî neçar dimînin bona çareserkirina vê pirsê bi Îranê re hevkariyê bikin, lê Xulamreza Mîrekî, karnasê jîngeha deryayî vê yekê bi dûr dizane û eşkere dike ku li egerek wusa de gewriya Hurmizê pîs nabe. Ji ber ku du rû û laye ji avê li wir hene. Rûye jêrîn de av diherike û diçe. Li rûyê serwe yan jorîn de jî av tê. Wate du cereyanên cur bi cur yên avê li wir hene.

Ji hêla din ve jî li dema şerê Îraq bi Kiwêtê re, rêjeya pîsatiya ava kendavê giha bilindtirîn asta xwe û ji ber herikîna du pêlên cuda tirajîdiya dilxwaze Îranê neqewimî.

Li gor vî karnasî, bûyera ku li Kendava Mikzîkê de qewimî û tirajîdiyek jîngehî pêk anî, li kendava Fars de cihê dubare bûnê nine. Çûnku ger pîsbûna bi wê rêjeyê jî rû bide, li pey herikîna avê de wê ron bibe. Lê li her hal de divê pêşiya qewimîna bûyerek wusa bê girtin.

Her sê karnas li ser vê baweriyê ne ku encamdana karek wusa bi her sedemekê be, ragihandina şerê bi cîhanê re ye û li encam de ne tenê nabe sedema qutbûna tehrîman, belkî dê zêdetir jî bike û egera êrîşa leşkirî jî dê xurttir bike.

www.arsivakurd.org

# Roja cîhanî ya zarokan û rewşa wan di Îranê de



Arıf Vêlzî

Gelek kesayetî, nawend, dewlet û rêxistinên navnetewî, di pêxema bêtirkirina rewş û jiyana zarokan xebatên cur bi cur kirine. Berhema zehmetî û tekoşînên wan çend salan eve ku, di cîhanê de gelek rojên xasmanî weke 1'ê Joenê, 20ê Novambrê û 8ê Oktobrê weke rojên cîhanî ên zarokan hatine diyarîkirin û bûne sedema dilxweşî û sembola parastina maf û berjewendiyên wan di cîhanê de.

Sîstema siyasî ya Îranê jî, di roja 16'ê Meha Rezberê (8ê Oktobrê), peymannameya cîhanî ya mafê zarokan bi awayekî fermî vajo kir û bi wî awayî roja cîhanî ya zarokan li Îranê jî hate diyarîkirin da ku weke welatên din ên cîhanê berevanî ji maf û azadiyên zarokan bê kirin.

Di tewahiya welatên cîhanê de, çavdêrî û dabînkirina mafên xwezayî û destpêkî ên zarokan û rakêşan û handana wan bo aliyê xwendin û perwerdekirin bi zanista serdem û herweha başkirina rewşa saxlemî ya wan û rêgirtin ji nexweşiyên cur bi cur û mirina wan dikeve stûyê desthilatê, Lê mixabin li Îrana bin deshilata Komara Îslamî de, di dema vajokirina peymannameya mafê zarokan ve heya niha tu pêngavek, ne ji aliyê Wezareta "Rifah" û kar û barên civakî û ne ji aliyê Meclîsa Îranê û ne jî tu nawend û dezgehên hikûmetî ên peywendîdar bi rewşa zarokan ku dikarin rolek erênî li dor nehêlana pirsgrêkên ser jiyana wan di Îranê de bilîzin, nehatine avêtin û tu babetek nexistine ber bas û lîkolînan.

Sebeba sereke ya perawêz ketina zarokan di Îranê de, xirab bikaranîna desthelat û sermaye û samanên netewî ji aliyê karbidestên Komara Îslamî ye. Sermiyayek ku tê dizîn û li derweyî sînorên Îranê bo kar û barên terorîstî û desttêwerdan di hindurê welatên din de tê mezaxtin. Herweha seba cuntirol nekirina rêjeya nifûs di Îranê de û bi giştî pirsgirêkên abûrî, siyasî û zêdebûna diyarde û lawaziyên civakî weke telaqê, bengdarî û... hwd bûne sebeb ku zarok bibin goriyên sereke û beşe girêdayî bi rejîmê û berpirsan bibin xwedî serwetên zaf û kovalîteya jiyana wan bilindtir bibe.

Di hember de jî beşa zêdetir a civakê pitir ber bi hejarî û bêparbûnê ve biçe. Encama ev siyaseta Komara Îslamî heya niha eve ku bazneya hejarî û destkurtiyê di îranê de roj bi rojê berfirehtir bibe û hejmara zarokên xiyabanî jî bigîje qasekê ku bibe cihê nîgeraniya nawend û rêxistinên navnetewî û çalakên mafê zarokan û weke karesatek metirsîdar bidin xuyandin.

Serberê vê yekê ku li gor madeya 79 a yasaya kar di Îranê ku têde karkirina zarokên bin temenê 15 saliyê de ye hatiye qedexekirin, lê li gor amarên nawenda amara Îranê, nêzîk bi 3 milyon zarok û li gor amarên karnas û çalakên mafê zarokan nêzîk bi 7 milyon zarokên kar di Îranê de hene ku ji mafên xwe ên herî despêkî bêpar in û bi dirêjahiya rojê bo têrkirina xwe û malbatên xwe bi kêmtirîn heqdest mijûlê karên giran û pir zehmet weke karkirin di kûrexane û kargehên cur bi cur de ne.



Ev zext û givaşên abûrî di Îranê de ku di çend salên derbazbûyî de çend qat bûne rêxweşker bûye ku beşek ji wan zarokên kar û xiyabanî bihên lêbandin û bikevin davika bandên mafiya ên qaçaxa însan û qaçaxa madeyên hişber û motad dibin û di encam de dikevin ber lêdan û îşkenceyên hikûmeta melayan û tarîperestên cemaranê di girtîgehên Îranê de bi cezayê îdamê re berbirû dibin.

Niha piştî derbazbûna pitir ji sî sal desthilatdariya melayan di Îranê de, rewşa xirab ya jiyana xelkê bi giştî û zarokan bi taybatî, abûriya herifî, mûdîriyeta nedirust ya deshilata siyasî, sîstema xirab ya perwerde ya zarokan û herweha rewşa nebaş ya navxweyî û hisar û tehrîmên cur bi cur û giranî ya bazarên Îranê û gelek belgeyên din selmênerê vê rastiyê ne ku rewşa zarokan di Îranê de ber bi pêşerojek metirsîdar ve diçe û bi vî awayî dahatiya civaka Îranê bi tewahiya netewan ve cihê nîgeraniyê ye û hewceyî pilanên pêşgîrî ji xurtbûna vê rewşê û geşandina rewşa zarokan e.

## Hewlêr wek paytexta geştûguzara Erebî hate destnîşan kirin

**Li Qahîreya paytexta Mîsrê de pêşbaziya destnîşankirina paytexta geştûguzarê a welatên Erebî ji aliyê Civata wezîrên geştûgozarê ên welatên Erebî ve hate encamdan, û bajarê Hewlêrê wek paytexta welatên geştûgozara Erebî bo sala 2014'ê hate destnîşankirin.**

Ew hilbijartin jî li ser bingeha çend pêweran bû ku a herî giring guherîna geştûgozariyê ye li navbera vî bajarî û bajarên din ên welatên Erebî de.

Şarezayên vî warî jî li ser vî baweriyê ne ku nebûna emniyet û asayişê li çend welatên Erebî û ew şoreşên ku li wan welatan de rû dan, bandora xwe hebûye li ser diyarîkirina Hewlêrê wek paytextê geştogozariyê.

Newzad Hadî parêzgarê Hewlêrê jî li kongireyeke çapemeniyê de ragehand ku çend sedemên bingehîn wek hebûna gellek hotêl û motêlan, warê emnî, rewşa hewa, şûnwar û başiya rê û banan rolê xwe di dana biryarek weha de hebûn.



## Her sal lehî canê 226 Îraniyan digre, berpirs jî her xemsar!!

**Li ser bingeha serjimêriyan li 53 salên borî de zêdetir ji 12 hezar Îraniyan li encama lehiyê de canê xwe ji dest dane.**

**Eva jî di demekê de ye ku Rêkxirawa Midûriyeta Kirêzê ragehandiye ku wan 1200 bernameyên pêşgîrîkirina ji xesarên bi riya lehiyê ve encam dane.**

Li gorî nûçeya Şehrzad news'ê, her di vî heyamî de 5821 bajar û 245 hezar yekîneyên avahiyan li encama lehiyê de herifîne û herweha 471 ser pez û malatên xelkê bûne qurbanî û yek




milyon hiktar ji zewiyên cotkaran jî têk çûne.

Ji aliyek din ve Mihemed Damadî nûnerê xelkê Sarî li parlementoyê de ragehandiye ku her sal piştî sê çar demjimêran barîna berdewam ya baranê, hinek ji xelkê têne kuştin, gund û zeviyên gundiyan têk diçin, berpirsyar tên serdan dikin, lê tu tişt naguhere û salên piştî wê, dîsan ew rewş her berdewam dibe.

www.arsivakurd.org

**Xalid Xaldar:**

# Cara yekem min Dr. Qasimlo li çarçiraya Mihabadê de dît ku li ser taqma Heft kesî diaxivî, her li vir ez ketim jêr bandora axaftinên wî



**Xalid Salihî, naskirî bi Xalid Xaldar, sala 1344’ê li gundê Gamêşan ya ser bi bajarê Mihabadê hatiye dinê.**
**Xalid Salihî her di temenê şeş saliya xwe de, li gundê Gamêşanê diçe mektebê heya ku dewrana despêkî ya xwendina xwe bidawî tîne. Piştre bo domandina xwendina xwe diçe bajarê Mihabadê, piştî derbazbûna sê salan qonaxa nawendî ya xwendina xwe bi dawî tîne ku hevdem dibe di gel serhildana şoreşa gelên Îranê di sala 1357’ê de.**

Xalidê şoreşvan despêka nasîna xwe bi PDKÎ re, weha tîne zima: “Bi sedema vê yekê ku şehîd Ebdulla Moînî û şehîd Mîne Şem ku di şoreşa salên 1346 û 1347’an de beşdar bûn, xelkê derdora me bûn û her li derdora gundê me de jî hatin şehîdkirin, û herweha bi sedema vê ku bavê min jî di dema şoreşa 46, 47’an de weke endamê PDKÎ xizmet bi gelê Kurd û PDKÎ dikir, min partiya Demokrat nasî û eva bû despêkek ku min siyaset û şêwaza xebata partiyê, bi şêwazek rast zanî ku di pêxema rizgariya gelê kurd de dixebite, lewma min biryar da ku ez tevlî refên partiyê bibim, lê mixabin seba kêmbûna temenê min, Hêza Pêşewa ez qebûl nekirim, lewma ez hatim binkeya Deftera Siyasî li Şêwe Coyê (Dola Dêmokrat) û li vir de ez weke pêşmerge dame Hêza Parêzgariyê û şerefa pêşmergatiyê PDK bi min re bexşîn.

Havîna sala 1367’ê, ez cardin vegeriyam Îranê û li vir tevlî jiyana xwe ya asayî, min dest avête karê teşkîlatî li hûndurê welat. Sala 1372’ê li ser daxwaza şehîd Ebdulla Şerîfî cardin ez wegeriyam nava refên PDK de û xebata xwe min domand.


Xaldarê şoreşgêr derheq jiyana xwe ya hevpar weha diaxive, sala 1369’ê, min di gel Gelawêj Ehmedî jiyana hevpar pêk anî û berhema jiyana me jî çar keç in.

Bîreweriya herî xweş ya Xalidê pêşmerge weha xwe derdixe holê, sala 1358’ê, dema ku kongireya çar hat lidarxistin û taqima 7 kesî refên partiyê bi cî hêlan, Kak Dr. Qasimlo, li Meydana Çar Çira ya Mihabadê kombûnek bi xelkê derdorê re pêk anî û têde basek li ser taqma 7 kesî pêşkêşî beşdarên kombûnê kir. Vê rojê bo cara yekem min Dr. Qasimlo dît, lewma dîtin û gotinên wî ez xistim bin bandore xwe û pir keyfa min pêre hat.

Xalid Salihî weke bîreweriya herî nexweş a jiyana xwe bi Agiriyê re dibêje ku şehîdketina Dr. Qasimlo bi qasekê bandorek xirab xist ser min ku, piştî derbazbûna çend salan bi ser şehîdketina wê jî, hêj nîşanên wê xwe derdixin hole. Sala 1375’ê, em vegeriyan menteqê û di şerekê de ku di navbera me û hêzên Komara Îslamî de rû da, ez birîndar bûm û destê min şikest. Piştî vegeriyanê ji menteqê, di sala 1376’ê bo emeliyata destê xwe, ez çûme nexweşxaneya Cimhûrî li bajarê hewlêrê. Piştî emeliyatê dema ez hatim ser hişê xwe, min hest bi vê yekê kir ku ez bona şehîdketina Dr. Qasimo digiriyêm, lê dema ku min çavên xwe vekirin, min dît ku nêzîk bi 25 kes ji nexweş û karmendên naxweşxanê hatine bal min û weke min bo Dr. Qasimlo digiriyan. Lewma ez dibêjim ku niha jî birîna ji destdana Dr. Qasimlo bo min kûr û nû ye.

Xalidê pêşmerge gotinên xwe bi vî awayî bi dawî tîne, daxwazê ji xelkê Kurdistanê, ji jin, mêr, keç, û kuran dikim ku weke salên berê piştewanê PDKÎ bin, çûnkî Hizba Demokrat hizba tewahiya xelkê Kurdistanê ye, hizba wane ku hêj ji dayîk nebûne.

> ***niha jî birîna ji destdana Dr. Qasimlo bo min kûr û nû ye***



Guhertin bilez û nêzîk in û xelkê Kurdistanê bila bêhêvî nebin û piştevaniya xwe ji PDK bidomînin. Ciwanên me dirêjiyê bi xwendinê bidin û xebat û tekoşînê di hundur de bidomînin û xwe ji diyardeyên nehez ên civakî weke madeyên hişber biparêzin.




**Elî Gûderzî naskirî bi mam Elî, kurê Ezîz, sala 1330’an, li Gundê Qurmîş ya ser bi bajarê Bokanê di malbatek feqîr û hejar de hatiye dinê.**

Elî Gûderzî weha ji Agirî re bas ji jiyan û xebata xwe dike: “Seba feqîrî û destengiya malbata me û herweha xistina ferq û cudahiya di navbera xelkê feqîr û hejar di qutabxaneyan de, mixabin min bi tenê karî heya sala sê a despêkî herim qutabxanê, û paşan destan ji xwendinê bikêşm û dest bavêjim karê şiwantî û ajeldariyê. Piştre dayk û bavên min çûn ber dilovaniya xwe, lewma min gundê xwe bi cih hêla, û seba karkirinê ber bi bajarê Şinoyê ve çûm”.

Mam Elî têkiliya xwe bi PDK Îranê re bi vî awayî tîne ziman: “Dema ez çûm bajarê Şinoyê, li mala kesek kal de dimam, û ew kes jî endamê PDKÎ bû û gelek basê Hizba Demokrat û pêşmergên vê bi min re dikir. Hevdem digel vê yekê pêlên nerazîbûnê li dijî rejîma paşatiyê serî hildan û rejima Pehlewî herifî û PDKÎ jî xebata xwe ya nihênî eşkere kir û dest avêt rêxistina xelkê Kurdistanê, bi vî awayî min PDKÎ nas kir, û di sala 1358 de ez tevlî refên pêşmergeyên PDKÎ bûm û di hêza Simko de hatim sazimandan”.

Mam elî di bersiva pirsiyara min de zehmetiyên pêşmergatiyê weha tîne ziman: “Di jiyana pêşmergatiyê de birçîbûn, Birîndarî, şehîdketina heval û hevçeperan, pir zehmet e.

Mam Elî li dor ferq û cudahiya di navbera jiyana pêşmergatiya çiya û jiyana niha di kempan de dibêje ku jiyana di çol û çiyayan de, pir zehmet e, birçîtî, nesaxî û birîndarî û gelek arîşeyên din, jiyanê li ser pêşmergan pir zehmat dikin, lê dema ku pêşmerge vedigeriya menteqê û digel ogirî û evîndariya gelê xwe berbirû dibûn û bi awayek gerim dihatin pêşwazîkirin, tewahiya rojên dijwar ku di çol û çiyayan de di gel zehmetiyan berbirû dibûn, dihatin jibîrkirin û cardin bi dilxweşî xebata xwe didomandin, lê îro di nava kempên me de îmkanatên jiyanê berfirehin û em bi yarmetî û alîkariya partiya xwe dijîn”.



Mam Elî dibêje ku dema me êrîş dikire ser binke û paygahên dujmin û em bi ser diketin, piştî bidawîhatina operasiyonan, em pir dilşa dibûn û bi hevre govend digirt û RDKÎ me gudarî dikir, eva bîreweriyek herî xweş a pêşmergatiya min e.

Lê bîreweriya nexweş ya jiyana min roja 22’ê Pûşpera sala 1368’ê ye. Dema ku Dr. Qasimlo şehîd kirin, em bi qasekê aciz û nerihet bûn ku me nedikarî nan bixon, çûnkî şehîdbûna wî pir giran bû.

Elî Guderzî bi vî awayî gotinên xwe bidawî tîne, şehîd ketina Dr. Qasimlo û herweha çend hevalên min di hêza Agirî li çiyayê Dalanper de, derbek pir giran bû li ser PDKÎ, lê em qahîmtir ji berê xebitîn û me derfeta vê yekê neda ku ev derba giran rolek xirab bixe ser karûbarê partî û pêşmergan. Lewma ez dibêjim ku îman û bîr û baweriya me bi Kurdayetî û PDKÎ bi qasekî qahîm û bi hêz e ku xebata me heya dilopa davîn ya xwînê, wê berdewam be.

> ***Pêşwaziya her timî ya xelkê Kurdistanê ji me, êdî tewaya êş û zehmetiyên çiya ji bîra me dibirin***

www.arsivakurd.org

# Bajarê Dîwandere





Mecîd Cinîkanlû

***Hinek ji serok hozên herêmê çendîn car tevî Simayîl Axa rûniştin hebûne û xwestine ku yarmetiya serhildana wî bikin. Li çaxê avakirina Komara Kurdistanê a Mihabadê li sala 1945'ê, çend kesayetiyên herêma Dîwanderê beşdarî rêûresma avabûna Komara Kurdistanê bûne***

Şaristana Dîwandere yek ji şaristanên Parêzgeha Sinê li Rojhilatê Kurdistanê ye ku xwedî dîrokekî gelek kevn e. Bajarê Dîwandere berê wek Mîran Şa, dihate binavkirin, û li piraniya çavkaniyên dîrokî de bi vî navî hatiye nivîsandin.

Dîwandere li 98 Kîlomêtriya bajarê Sinê hilketiye û li bakûr tevî bajarê Tîkabê, li rojhilat tevî bajarê Bîcarê, li bakûrê rojava tevî bajarê Seqizê, li rojava tevî bajarê Merîwanê û li başûr tevî bajarê Sinê hevsînor e.

Rûberê giştî yê Şaristanê 4204 Kîlomêtra çargoşe ye ku 15% ji panahiya şaristana Sinê pêk tîne. Herêma han li Zivistanan de gellek sar û li Havînan xwedî av û hewayekî xweş e.

Hebûna hin şûnwarên dîrokî wek Şikvta Kereftû, wê rastiyê nîşan didin ku ew herêm xwedî dîrokekî gelek kevine ku ji bo 2000 sal berî Zayînê vedigere. Kurdên herêmê bi zaravayê Soranî dipeyvin. Li herêmê de gelek zaravên din jî hene û hozên wek Goran, Golbaxî, Tîlekûyî, Caf Minimî, Kelhûr û...hwd jiyanê dikin. Nifûsa giştî ya Şaristanê 87747 kes e.

Şaristana Dîwandere xwediyê sê herêmên Navendî, Kereftû û Saral e, ku bi giştî xwediyê 196 gundan û 2 bajarên Dîwandere û Zerîne ye. Navenda Şaristanê bajarê Dîwandere ye ku li deştekî pan û berîn de hilketiye.

Şaristana han seba hebûna deştên wek Ubato û Saral yek ji navendên serekî yên dabînkirina Genim û xwedîkirina pez e, û ew dû kare li rastiyê de çavkaniya dahata xelkê herêmê ye.

Li şaristana Dîwanderê de gelek çem û rûbarên Mezin hene ku piraniya wan li Biharê bi heliyana ava berfê li nav deşt û çiyayên herêmê de diherikin. Çemên Qizil Ûzon û Yûlkiştî du rûbarên herî pir av yên herêmê ne.

Dîwandere cihê hatûçûna eşîrên Kurd bûye û zaf li Eşîrên herêmê seba zozanan mifah jê sitandine. Li serdemê Sefewiyan ew herêmê seba cihê xwe yê xweş hêdî hêdî xelk li wir akincî bûne. Kurdên Dîwandere xwediyê keltûrekî gelek bihêz in û çanda wan wek pişkek mezin ji çanda Kurdistanê ye.

Şikevt û Kela Dîrokî ya Kereftû ku li vê Şaristanê de cih girtiye, dîroka vê ji bo hezar sal berî Eşkaniyan vedigere. Ev kel li çar pişkan pêk tê, û xwedî dîwexanên pir balkêş e.

Kurdên Dîwandere serbarê vê yekê ku li zaf zarav û ol û mezhebên curbicur pêk tên, lê xwedî rihekî mezin ya Kurdayetî û welatparêziyê ne. Kurdên li herêmê li hemberî rejîmên dagîrker yên ku bi ser Îranê de hakim bûne, gellek xebat kirine û di rêya han de gelek qûrbanî dane.

Li serdemê rejîma Şahê Îranê de Kurdên herêmê li serhildana Simkoyê Şikak xwedî derketine û pêka hin çavkaniyan hin ji serok hozên herêmê çendîn car tevî Simayîl Axa rûniştin hebûne û xwestine ku yarmetiya serhildana wî bikin. Li çaxê avakirina Komara Kurdistanê a Mihabadê li sala 1945'ê, çend kesayetiyên herêma Dîwanderê beşdarî rêûresma avabûna Komara Kurdistanê bûne.

Li serdemê hatine serkara Komara Îslamî ya Îranê gelê herêmê bi rêberiya PDKÎ xebatekî bêmînak ji bo desteberkirina mafên xwe yên netewî meşandin û her seba vê yekê ew herêm jî wek piraniya bajarên din yên Kurdistanê kete ber êrîşa pasdarên Îmamê Zeman û zaf ji xelkê Sivîl yê herêmê hatin Şehîdkirin. Lê gelê herêmê û bi taybetî ciwanên welatparêz yên Kurd têkilî refên pêşmergeyan bûn û bi xurtî bersiva dagîrkeran dan û di riya han de gelek ji ciwanên welatparêz canê xwe goriyê riya rizgariyê kirin.

Kesên wek Serwan xeleban Îbrahîm Behrampoor ku yek ji Akadimiyên zanîngeha leşkerî ya Tehranê bû, çaxekê ku dît welatê wî ketiye ber êrîşa dagîrkeran hat û bi canê xwe berevanî ji xelkê xwe kir û di rêya gelê xwe de canê xwe fîda kir.

Dîwandere her wek derbasbûyî li çepera berevanî ji xwestekên gelê Kurd de rawestaye û hertim wek Kela Kurdayetiyê tê mêzekirin.



Şikevta kereftû di bajarê Dîwandere

www.arsivakurd.org

# Uzun, Stêrekek Geş Di Nav Wêjeya Kurdî De



Hemîd Muxtarî

Dema pênaseya netewe tê kirin, yek ji fakterên sereke navbirî ye ji ziman, ku edeb û wêje yek ji xalên bingehîn yên ziman e. gellek netewe li cîhanê de hebûne ku ji ber neparastina zimanê xwe û înkarkirina wê ji aliyê dagîrkeran ve yan hatine wunda kirin yan jî li metirsiya ji navçûnê de ne.

Gelê Kurd jî ku xwedî dîrokek dirêj e, gellek astengî ji aliyê dagîrkeran ve ji bo wan hatiye pêş û hewla jinavbirina şunasa wan hatiye dan, di vê pêxemê de kêm û zêde, dujminan kariye hinek bandorên nerênî bixin ser gelê me û beşek ji dîrok û zimanê me bidin mehandin, lê nekarîne û nikarin bigîjin armanca sereke ya xwe anku wundakirina gelê me.

Netewa Kurd û rewşenbîrên vî gelê hertim bi berhemên xwe û ji rêya rewşenbîrî ve hewil dane mana xwe biparêzin, nemaze nivîskarên me di warê edeb û wêje de hewild dane ku wêjeya Kurdî xwedî pênaseyek serbixwe be û kar ji bo pêşxistina zimanê dayîkî bike.

Her di vê pêxemê de û ji bo vê armancê ew xwedî rol û bandork mezin bûne, Kesên weke Cîgerxwîn, ku weke yek ji helbestvanên herî mezin di dîroka Kurd de tên nasîn, ya Melayê Cizîrî yan Hêmin Mukriyanî li Rojhilatê Kurdistanê û gellek kesên din.

Lê gelê Kurd tenê bi van kesan nahê nasîn û gellek kesên din jî hebûne û hene ku kar ji bo parastina zimanê dayîkî kirine û hemû temenê xwe di xizmeta ax û gelê xwe borandine.

Bo mînak Mihemed Uzun ku yekî din ji wan edîbzan û nivîskarên Kurd e û şûnpêyê wî di dîroka Wêjeya Kurdî de pir zelal û diyar e.

Ji ber ku çend roj beriya niha 5-mîn salvegara koça wî bû, me bi hewce zanî ku ji bo rêzgirtin ji hewil û xebata wî, wî bi bîr bînin.

Miehed Uzun ku di sala I953-an de li bajarê Sîwêrki li Kurdistana Bakûr de ji dayîk bû, heyamek dirêj ji temenê xwe ji bo wêjeya Kurdî terxan kir.

Wî di serdemekê de dest bi nivîsandin bi zimanê Kurdî kir ku ev ziman ji aliyê Hikûmeta Tirkiyê ve hatibû qedexekirin, lê welatparêziya Uzun bû sedem ku ew nasnameya rastîn a xwe ji bîr neke û bi pênûsa xwe di pêxema pêşxistina zimanê dayîkî û parastina wê de gavan biavêje.

Navbirî heta ji ber vê yekê di 21ê Marsa sala 1976-an de bi sedema edîtkirina Govara Kurdî-Tirkî hat destbiserkirin û bi buxtana cudahîxweziyê bo heyamê 8 mehan bi zîndanê hat mehkûmkirin û ket zîndana navendî ya Ankara.

Uzun piştî azadbûnê ji ber qedexebûna zimanê dayîkî û nebûna derfet ji bo xizmetkirin di vê beşê de, bi neçarî rû ji xerîbiyê dike û di sala 1977-an de li Swêdê akincî bû û weke penaberekî dûr ji welat jiyana xwe li wir didomîne û beşek zêde ji berhemên xwe li wir nivîsand û ku beşek zaf ji wan ji aliyê Enîstîtûya Kurdî li Parîs de hat çapkirin.


Mihemd ji boy ku bikaribe zêdetir ji dîrok û wêjeya Kurdî bizane, xwe hînê tîpên Erebî dike û bi vî awayî dikare ew berhemên nivîskarên Kurdan ku bi tîpên Erebî hatine nivîsandin bixwîne û wan şirove bike.

Navbirî çendîn berhem bi zimanê Kurdî, Tirkî, Almanî, Englîzî û...hwd hene ku beşek ji wan berhemên wî yên bi zimanê Kurdî me ji malpera wikipedia.org wergirt, bi awayê jêrîn e:

- **Tu, Dengê Komal (roman, 1984)**
- **Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê, Orfeus (roman, 1987)**
- **Mirina kalekî rind, Orfeus (roman, 1989)**
- **Siya evînê, Orfeus, (roman, 1989)**
- **Destpêka edebiyata kurdî, Beybûne, Ankara (lêkolîn, 1992)**
- **Hêz û bedewiya pênûsê, Weşanên Nûdem, (pexşan, 1993)**
- **Antolojiya edebiyata kurdî, 2 cild, Tüm zamanlar yayıncılık, Istanbul (antolojî, 1995)**
- **Bîra qederê, Sara, Stockholm / Avesta, Istanbul (roman, 1995) [ISBN 975-7112-67-4]**
- **Världen i Sverige (tevî Madeleine Grive), En bok för alla, Stockholm (antolojiya helbestan, 1995) [ISBN 91-7448-830-9]**
- **Nar çiçekleri (Kulîlkên Hinarê), (pexşan, bi tirkî, 1996)**
- **Ziman û roman, Weşanên Nûjen (hevpeyvîn, 1996)**
- **Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê, Weşanên Avesta (roman, 1998) [ISBN 975-7112-38-0]**
- **Dengbêjlerim (Dengbêjên Mi), Pexşan, Tirkî, 1998**
- **Hawara Dîcleyê 1, Avesta, Istanbul (roman, 2001)**
- **Zincirlenmiş zamanlar zincirlenmiş sözcükler (Demên zincirkirî peyvên zincirkirî), (pexşan, bi tirkî, 2002)**
- **Dengbêjlerim (Dengbêjên min), Pexşan, Tirkî, 1998**
- **Hawara Dîcleyê 2, Avesta, Istanbul (roman, 2003)**
-

Mihemed Uzun seba ew xebatên xwe yên di warê wêje de karî xelata Torgny Segerstedt ya sala 2001-an bi dest bixe û di sala 2005-an de bû endamê Saziya Xwedî Pênûn-an û herwiha Civata Nivîskarên Swêdê.

Di sala 2006-an de mixabin Uzun tûşî nexweşiya seretanê hat û piştî salek berevanîkirin li hember nexweşiyê de navbirî di roja 11-10-2007-an de li Amedê jiyana xwe ji dest da.



## Kaniya helbestan



## Ji kû heya kû

Ka binihêre !
Ev rê...
Ev rê rêya me ye

Bûye lûsa rawil û sewalan,
Ji fêkîyên nêrît û janên me,
Ji hêvî û ramanên me doşekên sitûr girêdane
Li ser wan mar û dûvpişkan pal dane,
Dûyê qelûnên wan bûne ewrên reşgiran li ser baxên me.
Li benda barîna herî bi xişm me teyroka wan î xezeban.

Ka binihêre !
Ev rê...
Ev rê rêya me ye

Ji peşkên barana şerê azadîxwaziya me,
Pêlên dijwar yên neyartiyê dizên,
Ji ava zelal vedixwin dostên me!!!
Ew xwarinxurên demekî sifra me ya dewlemendiyê
Şaredariya xwe avakirine li ser qûlpikên têrxwarinê.

Ka binihêre !
Tu nas dikî?
Ev rê rêya me bû

Rêya min û te,
Bûye korç û newal,
Di yek ji wan korçan de veşartî me ez,
Bûne delavokên hûrik di korçan de hestên me,
Weke sêwîstêrkan li hev civîyane.
Dilerizin...

Çawa be jî, ev rê rêya me bû,
Xirab be jî ezê wê biparêzim
bi xwezaya xwe ya jinantiyê.
Çawa be jî ked û xwêdana me rijîyayê.
Bixwazî dîsa were, hewl bide û bimeşe,
Ezê nas bikim pêlkirina te,
Nas bikim ezê,
rêçên te yên nermik
li ser çavên xwe...

Malpera beribihar.com

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com








Cundê Palimgan bajara Kamyaran

## pênc Îranî berbijêrên xelata Astrîd Lîndgirnê ne




**Li gorî nûçeyan pênc Îranî çûne nava rîzbenda berbijarên xelata sala dahatî ya Astrîd Lîndgirn li Welatê Swîdê de.**

Xelata Astrîd Lîndgirn, xelata herî mezin ya hewzeya kitêbên zarokan e. Serokê lêjneya dawerên xelata navbirê, navê 207 nûser, dîzaynêr û bilavkerê kitêbên zarokan li 67 welatên cîhanê de eşkere kir ku di buhara dahatî de wek berbijarên serkevtî bihên diyarîkirin.

Ehmed Riza Ehmedî, Ferşîd Misqalî, Tûran Mîr Hadî, Mistefa Rehman Dûst û Mihemed Elî Benî Esedî nûser û nîgarkêşên Îranî ne ku navê wan di nav berbijêrên xelata Astrîd Lîndgirn de hatiye.

## Hemwelatiyekî Hindistanî di 96 saliya xwe de bû bav

**Hemwelatiyê Hindistanî ê bi navê Ramjit Raghav di 96 saliya xwe de bû bav û rekora dinyayê şikand.**

Raghav du sal berî niha di 94 saliya xwe de jina xwe Shakuntalayê ducanî kiribû û ketibû nav pirtûka rekoran a Dinyayê "Guinnes"ê, û çend roj beriya niha bû bavê kurekî.



Navbirî tevî jina xwe Shakuntalaya 54 salî li pêşberî çapemeniyê de ragehand ku ez dixwazim her şev bi jina xwe re sê caran bikevim nava têkiliya cinsî de."

Wî herweha ji çapemeniyê re diyar kir ku di ciwaniya xwe de her roj nîv kîlo behîv û sê lîtr şîr vexwariye.

Burhan Kuzu:

## Perwerdeya bi Kurdî şeytanî ye




**Parlematerê AKP, Burhan Kuzuyê ku serokatiya komisyona makezagonê dike, di pêvajoyeke ku hêviya diyalogê xurt bûye, dibêje ku perwerdehiya bi zimanê Kurdî bi qisa şeytên kirinê ye.**

Li gorî nûçeyan, Burhan Kuzu'yê AKP'yî, li ser ekranê televizyona TRT Turkê, dibêje "Ger wek her carê, sibê BDP şeytaniyê bike û perwerdehiya bi Kurdî bixwaze wê çi bibe?" li ser vê pêşkêşvanê bernameyê ji wî dipirse, "Perwerdehiya bi zimanê Kurdî bi gotina şeytên kirine?"

Kuzu li bersivê de dibêje "belê, ez ji bo welêt wisa dibînim. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî wê welêt dabeş bike" Burhan Kuzu, li meclîsa Tirkiyê, ji Komisyona Makezagonê re serokatiyê dike ku, makezagoneke nû a sivîl, wekhev, azadîxwez û li gorî pîvanên maf û hiquqê bê çekirin. Lê bi vê zêhniyetê zehmete!!

